Newroz **Hejmar(66)** **Rûpel (2)** **Sibat 2006z – 2617k**

Hevpeyvîn bi mamoste Hemîdê Hecî Derwêş re

Sekreterê partiya demokrat a pêşverû ya kurd li Sûriyê

Mamoste Hemîd, em kêfxweş in bi navê weşana Newroz, vê dîtinê bi we re bikin, li we guhdariyê bikin, nerîn û bîrbaweriyên we di ezmûna xebata bêtir ji 50 salî di ber doza gelê kurd de, biguhêzin xwendevanên Newrozê. Gelekî bi xêr hatî..

1- Di wan rojên berê de ku asteya hesta netewî li ba gelê me ji ber sedemên tunebûna xwendin û zanînê, merc û hoyên eşîrtî, malbatî û hwd... qels bû, şêweya kar û xebata we hingî çawa bû?.

Dsetpêka derbasbûna min di tevgera siyasî de, rewş gelekî tevlîhev bû, hestê netewî kurdî gelekî sivik bû û kesên di vî warî de kar dikirin hindik bûn.Tenê, hestê olperestî û êlperstiyê cihê xwe di nav gel de girtibû. piştî me partiya demokrat a kurd li Sûriyê damezirand, gelek kelem û asteng li pêş me derketin, nemaze di warê diraviyê de û şerê olperstan û partiya komonist ji parta me ya nû re. Lê, ji ber girêdana me, bi doza me ya netewî ve û israra me, me karîbû em şopa xwe vekin.Di vir de, ez ji dîrokê re dibêjim ku hevalê rehmetî ***Osman Sebrî*** *di pêşiya me hemiyan de bû.*

2- Piştî van guhertinên ku li seranserê cîhanê rû dane, mîna pêşketina bê sînor a dezgehên ragihandinê, geşbûna xebata gelên cîhanê ji bo parastina mafên mirovan, şerê cîhanê dij terorê, û rûxandina rijêma Sedam li Iraqê, û ya Taliban li Afganistanê... Hûn paşeroja gelê kurd bi gelemperî, û gelê me yê kurd li Sûriyê bi taybetî çawa dibînin?.

Bêgumane ku gelê me yê kurd, di siha rijêmine diktator, nijadprest û hov de, ewên hewil dane wî tune bikin, qonaxine perîşan û dilêş derbas kirine, bi hezaran qurban û cangorî pêşkêş kirine, bextiyariya xwe winda kiriye. Lê, îro em di qonax û demeke nû de dijîn, nîşan û sembola wê demokrasî û parastina mafên mirovan e. Ev yek, mizgîniya qonaxeke nuh dide me ku gelê me dê xewnên xwe di azadî û bidestxistina mafên xwe yêm netewî û rewa de bibîne. Lê, divê em zanibin çawa sûd û mifayê ji vê qonaxê wergirin. lewre divê em siyaseteke zanistî, demnas û realist bikar bînin, ji dilxwestin û ewatifan bidûr Kevin.

3- Welatê me Sûriyê, li ber dergehê guhertina ye, gelo rewşa tevgera me ya kurdî ya îro, dikare rêbertiya qonaxa bê bike? Û eger na be, hûn çi xebatê di ber yekirina vê tevgerê de dikin?.

Belê raste ku welatê me Sûriyê li ber dergehê guhertinin nuh e, û raste tevgera kurdî ne weke em dixwazin bi hêz û hevgirtî ye, wilo jî tevgera netewî ya Sûrî bi tevayî, lê ez dibînim û bi bawerîke mezin dibêjim ku tevgera me ya kurdî dikare li kêleka tevgera netewî ya Sûrî bi rola xwe rabe û pêşkêşiya wan guhertinan bike. Divê em bizanin

D.R (3)